

# Kobanê û êrişa 15`ê Ilonê... destpêka bidawîbûna DAIŞ`ê

Beriya 5 salan daholên cengê li ber sûrên bajarê Kobanê lê ketin û bi hezaran çeteyên DAIŞ`ê ji bo dagirkirina bajar tevî gundên Kobanê êriş kirin. Lê bi saya berxwedana şervanên YPG û YPJ`ê, dengya şer bi yekcarî guherî û cara yekê DAIŞ`ê têk çû.



Çeteyên DAIŞ`ê ku herêma Kobanê ji sê aliyên ve dorpêç kiribû û Tirkiyê jî di aliye çaran de dorpêç kiribû, di 15`ê Ilona 2014`an de êrişeke mezîn anî ser gundên Kobanê. Piştî ku çeteyên DAIŞ`ê Mûsil, her wiha liwaya rejîma Sûriyê 93 ya li Eyn İsayê û gelek çek û cebîlxane û bi dehan tank û panzêr li wan herêman desteser kirin, hêza xwe li ser sînorê kantona Kobanê bi çih kir û li ser sê eniyên û bi dirêjahiya bi sedan kilometre daholên cengê lê ketin. Çeteyên DAIŞ`ê jî du eniyan ve anku ji eniya rojhilat û rojavayê bajarê Kobanê ve dest bi êrişê kir, ji ber hêza zêde ya çeteyan bi hevrukirina bi YPG`ê re, dikaribûn çend gundan dagir bike. Hêjayî birbirxistinê ye ku hêzên ku parastina Kobanê dikirin, tu tank an jî panzêrên xwe tune bûn, lê çeteyên DAIŞ`ê di her eniyekê de zêdetir 2 tank bi kar dianin, di heman demê de çeteyan topavêja 130 ku

dikaribû navenda bajarê Kobanê ji dûrîahiya 30 km toparan bike, bi kar dianî. Li hemberî hêza mezîn a çeteyên DAIŞ`ê, şervanên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) berxwedaneke bêhempa raber kirin û di vê oxirê de bi dehan şehîd dan û hinek ji wan jî çalakîyên fedayî wekî Rêvana, Arîn Mirkan, Baran, Serhed, Êriş û Zozan kirin. Lê berxwedana bi çekên hindik û sivik têrê nedikir ku êrişên DAIŞ`ê li ser Kobanê bide sekinandin. Berxwedana ku li gundên Kobanê hate meşandin, ji berxwedana ku piştê li kolanên bajar hate raberkirin, cudabûneke xwe hebû, ji ber ku paşdevekişandina YPG û YPJ`ê ku cara yekemîn e li hemberî DAIŞ`ê tê kirin, hêrs û hêza şervanên xurttir dikir û êdî ne mimkun bû ku gaveke din bi paş de vekişin û digotin "Mirin, lê ne paşde vekişandin". Bi zêdebûna êrişan, sivîl neçar man ku berê xwe bidin naven-

da bajarê Kobanê ya ku her roj dorpêçkirin li ser zêde dibû û da ku komkuji bi serê wan de wekî ku çawa li Şengalê di encamê de 5 hezar êzidî bûn qurbanî, pêk hat, pêk neyê. Di nava 10 rojan de, zêdetirî 300 hezar sivîlan berê xwe da sînorê bakurê kantonê ya ser sînorê Bakurê Kurdistanê. Piraniya sivîlên ku sînor derbas dikirin, berê xwe dida Sirûcê ya Bakurê Kurdistanê. Piştî berxwedana 20 rojan a li gundên Kobanê, çeteyên DAIŞ`ê di roja yeksemê de 5`ê Cotmeha 2014`an, girê Miştênûrê yê başûrê rojhilatê bajarê Kobanê ku li ser bajar serwer e, dagir kir. Piştê çeteyan bajar bi awayekî dijwar toparan kir. Şerê kolanan ku li bajarê Kobanê dest pê kir, li ser sê pêvajoyan bû, pêvajoya yekemîn, xeta parastinê ji bo paş de vekişin û digotin "Mirin, lê ne paşde vekişandin". Bi zêdebûna êrişan, sivîl neçar man ku berê xwe bidin naven-

nava kolanên bajar. Di wê rojê de, hin şervanên YPG`ê çalakîyên fedayî li Qada Azadî kirin û hemû cîhan ku çeteyên DAIŞ`ê jê gule diavêtin, kirin armanc û bi vê yekê şervanan dikaribûn rê li pêşiya pêşdehatina çeteyên DAIŞ`ê bigirin. Di wê demê de, herî kesî propaganda dikir û digot Kobanê "ha ket ha dê bikeve". Di şerê li Qada Azadî de, sînorek ji pêşketina çeteyên DAIŞ`ê re hate danîn û şervanên YPG`ê xetên xwe yê parastinê xurt kirin û şervan li ser rêbaza şerê kolanan hatin perwerdekirin. Bi vî awayî êriş li ser xetên parastinê yê şervanan dewam kirin û çeteyan nikaribûn bi pêş de vekişin. Şervanên YPG û YPJ`ê êdî roj bi roj mal û kolan ji çeteyên DAIŞ`ê rizgar dikirin û ev rewş heta 71 rojan dewam kir. Piştê, pêvajoya duyemîn dest pê kir. Şervanên YPG`ê êdî şerê gerilati da destpêkirin û kemîn, çandina mayinan, sekvanî û êrişên cur bi cur li hemberî çeteyan dane destpêkirin. Her wiha di wê demê de, fermandarên YPG`ê gotin derbeyên ku şervanên wan li dervayî bajar gihandin çeteyên DAIŞ`ê, êdî wan xetên xwe yê parastinê bêhtir xurt dikirin û êrişên çeteyan jî têk birin. Pêvajoya sêyemîn jî, di 18`ê Mîdara 2014`an de anku roja 94`an ji berxwedanê dest pê kir. Di wê rojê de, Hemleya Rizgarkirina bajarê Kobanê bi navê "Tolhildana ji bo Şehîdên Kobanê" dest pê kir. Hemleya ku 40 rojî dest pê kir, bajarê Kobanê bi temamî rizgar bû û êdî dengyên şer li Kobanê hatin guhartin û rewş bi temamî berovajî bû. **PIŞTIGIRIYA HERÊMÎ Û CÎHANÎ BI KOBANÊ RE** Berxwedana bêhempa ya ku şervanên YPG û YPJ`ê ji bo parastina Kobanê raber kir, bala hemû cîhanê kişand ser bajarê Kobanê. Bajarê Kobanê di demeke kurt de, bû sernavên sereke yê piraniya dezgehên çapemeniyê yê cîhanê û mijara liderên gelek dewletan. Dema ku DAIŞ`ê gihîşt bajarê Kobanê, gelê Kurd ê Bakurê Kurdistanê li piraniya bajarên Bakurê Kurdistanê rabû ser pêyan ji bo piştigiriya berxwedana şervanên YPG û YPJ`ê li Kobanê. Her wiha bi sedan ji gelê Kurd ê Bakurê Kurdistanê berê xwe da ser sînorê Sirûcê yê ser sînorê bajarê Kobanê û hinek ji wan jî sînor derbas kirin û tev li berxwedanê bûn û bajar parastin. Serhildana gel a li Bakurê Kurdistanê ku rojên 6-7-8 Cotmehê hate lidarxistin û di encamê de 40 sivil şehîd bûn, dewleta Tirk êrişî wan dikir da ku dengên ji bo piştigiriya Kobanê biçewisîne. Piştî meh û nîvekê ji destpêka berxwedanê û nexasim roja 1`ê Mîjdarê, Roja Piştigiriya Kobanê ya Cîhanê li ser daxwaza rawşenbîr û hejmareke mezîn ên mafêparêzan hate îlan kirin. Bi hezaran ji zêdetirî 90 bajarên li 30 dewletên cîhanê, daketin

qadan û di bin dirûşma "Serferberiya cîhanî ji bo Kobanê û mirovahiye li dijî DAIŞ`ê" piştigirî dan berxwedana Kobanê. **RIZGARKIRINA KOBANÊ** Piştî êrişa çeteyên DAIŞ`ê di 15`ê Ilonê de û piştî 20 rojan ji derbasbûna şer nava bajar, çeteyên DAIŞ`ê piştî 94 rojan ji şer dikaribû ji sedî 70 ji bajarê Kobanê dagir bike. Vê berxwedanê zemîna destwerdana Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ`ê bi rêveberiya DYA`yê ji bo destekdayîna YPG û YPJ`ê ya ku bajarê Kobanê diparast, danî. Şervanên YPG û YPJ`ê ku destanên lehengiyê nivisandin, piştî berxwedana 134 rojan bajarê Kobanê rizgar kir û roja 26`ê Çîleya 2015`an rizgarkirina tevahiya Kobanê ji çeteyên DAIŞ`ê hate ragihandin û li şûna ala reş, ala kesk, sor û zer hate hildan. Berxwedana Kobanê bêhtirî bibe berxwedana gelê Kurd, bû berxwedaneke navneteweyî ya ku hemû pêkhate beşdarî bûn. Kurd, Erebb, Fariis, Amerîkî, Bîtanî, Alman û Tirk bi hev re di heman xendeqê de li Kobanê şer kirin. Di Kobanê de, gelek şervanên enternasyonal şehîd bûn ku piraniya xwe Tirk bûn. Bi vê yekê jî îsbat bû ku berxwedana Kobanê berxwedaneke navneteweyî ye û serkeftina wê serkeftina hemû neteweyan e. **DAWIYA DAIŞ`Ê JI WIR DEST PÊ KIR** Bêguman berxwedana ku şervanên YPG`ê li Kobanê gihandin, çeteyên DAIŞ`ê û encamê de DAIŞ`ê têkçûneke mezin xwar, bû destpêka têkçûna DAIŞ`ê. Beriya têkbirina DAIŞ`ê li Kobanê, artêşên li herêma nikaribûn li pêşiya pêşdehatina DAIŞ`ê bisekinin, bajarê Mûsilê ku piştî Bexdayê mezintirin bajarên Iraqê ye, di çend saetan de kete destê DAIŞ`ê, her wiha bajarê Reqa yê Sûriyê jî. Li bajarê Kobanê li gorî agahiyan, 6 hezar çeteyên DAIŞ`ê hatin kuştin, her wiha hejmareke mezin jî birîndar bûn û di encamê de hêza DAIŞ`ê têk çû û piştî hemleyên leşkerî yê ku YPG`ê û piştê QSD`ê ji bo rizgarkirina herêmen Bakur û Rohhilatê Sûriyê jî DAIŞ`ê, êdî DAIŞ`ê nikaribû hêza xwe komî ser hev bikira. Li ser vî esasî Koalîsyona Navneteweyî ya bi serkeşiya DYA`yê, hevpeymanek bi YPG û YPJ`ê re çêkir, piştê ew hevpeyman bi QSD`ê ya ku ji ciwanên herêmen Bakur û Rohhilatê Sûriyê pêk dihat, çêkir. Bêguman, têkçûna DAIŞ`ê li Kobanê bandor li têkçûna DAIŞ`ê li Iraqê jî kir. Beriya êrişa DAIŞ`ê li ser Kobanê, çeteyên DAIŞ`ê her li Iraqê bi pêş diketin, lê piştî têkçûna DAIŞ`ê li Kobanê êdî rewş guherî. Êdî roj bi roj çeteyên DAIŞ`ê herêmen ku dagir kiribûn, winda dikirin û di aliye leşkerî de çeteyên DAIŞ`ê li gundê Baxozê yê bejahiya Dêrazorê di meha Adarê de piştî şerê 4 salan a li dijî vî rêxistina terorê, têk çû... **ANHA**

# MSD`Ê DAXUYANIYA WEZARETA KARÊN DERVE YA REJÎMA SÛRIYÊ RED KIR

MSD`ê daxuyaniya Wezaretê Karên Derve ya rejîma Sûriyê ku tê de QSD`ê tawanbar dîke, red kir û got dûtî rewşa heyî ye.



## Koalîsyona Navneteweyî: Gavên baş yê ewlehiyê hatine avêtin



## MSD: DAXUYANIYA REJÎMA SÛRIYÊ DÛRÎ RASTIYÊ YE

**Meclisa** Sûriya Demokratîk (MSD) daxuyaniyek der barê tawanbariya Wezaretê Karên Derve ya rejîma Sûriyê de ku li dijî Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) kiriye, weşand. Di daxuyaniyê de hate gotin ku Wezaretê Karên Derve ya desthilata Şamê daxuyaniyêke dûtî rewşa heyî ku tê de êrişî QSD`ê dîke û hemû tawanan lê bar dîke, weşand. MSD`ê got Ev daxuyani dûtî راستی ye, derewin û em red dikin. MSD`ê daxuyaniya rejîma Sûriyê bi lûtkeya li Enqereyê li dar dîkeve ve girê da û wiha daxuyand: "Em wan tawanan ji civîna ku de di navbera garantorên Astanayê de li dar bikeve, nabirin û qut nakin. Bi wê Tirkiyê razi dîke, hê jî diyar e hikumeta Şamê bi zîhnîyeta xwe ya ku bûye sedema van hemû wêranyan û hiştiye dewletên biyanî derbasî xaka Sûriyê bibin ve, girêdayî ye."

## MSD: QSD`Ê YEKÎTIYA XAKA SÛRIYÊ PARASTIYE

MSD`ê di daxuyaniya xwe de bi bîr xist ku divê bersiv ji artêşa dagirker a Tirk re bê dayîn, bi taybet ji ber wê xaka Sûriyê dagir kiriye. Di daxuyaniyê de li ser yekîtiya xaka Sûriyê teqezî hat kirin û ev tişt hate gotin: "Di ajoyên pêkhatiyên Bakur û Rohhilatê Sûriyê de parçekirina Sûriyê tune bû, lê belê ew herêma yekane ye ku parastina saziyên netewedewletê kiriye. Ew herêma ku QSD`ê li dijî terorê ser kiriye, yekîtiya xaka Sûriyê û tevahî pêkhatiyên wê parastîye." MSD`ê daxuyaniya rejîmê bi binkeftinê bi nav kir û wiha got: "Mîna ku li ser herêmeke din û mentiqekî din ku li ser wan herêman ne pêkan e, diaxeve. Mixabin ji çarenûsa dewleta Sûriyê re ku hê jî bi vî zîhnîyeta dewletê bi rê ve dibe. Her wiha em teqez dikin ku guhartina pergala despotîzma navendî erkeke neteweyî ye." **R-5**

## Li dijî tecawiz û komkujiyan li Efrînkaya Başûr çalakî

Li Efrînkaya Başûr her sal bi sedan jin li dijî şidetê bi dirûşma "Êdî bes e" dadikevin qadan. **R-3**



## Serkeftinên di qada perwerdeyê de



Ji destpêka ragihandina avakirina Rêveberiya Xweser a Demokratîk (21`ê Çîleya 2014`an), di qada perwerde de gelek pêşketin ji aliye materyal û rêbazên wanedayinê de, pêk hatine. **R-6**

## Aldar Xelîl: Efrîn çarenûsa tevahî Sûriyê destnîşan dîke

Endamê Desteya Rêveber a TEV-DEM`ê Aldar Xelîl teqez kir ku Efrîn dozeke mirovî û exlaqî ye. Xelîl diyar kir ku rola Rûsya di dagirkirina Efrînê de ya serke ve û got ku Efrîn çarenûsa tevahî Sûriyê destnîşan dîke. **R-4**



## Jinên Qamişlo: Tecrîd sûcê mirovahiye ye û divê bi dawî bibe



Jinên Qamişloyê bertek nîşanî tecrîda girankirî ya ku li ser Rêberê Abdullah Ocalan tê meşandin dan û gotin: "Dewletên desthilatdar nêrînen azad napejrin. Ji bo azadiya rêberê me şer me nema ye ,em ê jin xwedî li ked û felsefeya rêber Apo derkevin." **R-3**

## Silêman Erebb: Helwestên ENKS`ê nakevin xizmeta gelê Kurd

Endamê Meclisa Giştî û nûnerê PYD`ê li Başûrê Kurdistanê, Silêman Erebb, bang li hemû hêzên Kurd kir ku ji bo yekîtiya Kurdan bixebitin. Erebb got: "Em helwestên ENKS`ê şermezar dikin. Helwestên ENKS`ê nakevin xizmeta gelê Kurd." **R-4**



# Koalîsyona Navneteweyî: Gavên baş yê ewlehiyê hatine avêtin

Li gorî AFP`ê, Koalîsyona Navdewletî ku Washington bi rê ve dibe, ragihand ku têkildarî mekanîzmaya ewlekariya sînorê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya bi sînorê bi Tirkîyê ve, gavên baş hatine avêtin.

Di meha derbasbûyî de DYA û Tirkîyê der barê parastina sînorê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Tirkîyê de li ser mekanîzmaya ewlehiyê li hev kiribû, li ser vî esasî li herêmên li sser sînori di 8`ê Îlonê de dewriyeya yekemîn dest bi gera xwe kir. Enqereyê cidiyeta Washingtonê ji avakirina vê herêmê re rexne kir. Roja Yekşemê şandeyeke Koalîsyona Navdewletî serdana Meclîsa Leşkarî ya Girê Spî kir. Tê zanin ku ji meha derbasbûyî ve hêzên li Girê Spî dest bi vekişandina ji sînori kir.



Koalîsyonê bi nameyekê ku li rojnemevanan hate belavkirin, diyar kir ku têkildarî mekanîzmaya ewlekariya parastina sînorê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, wan di qonaxa yekemîn de gavên girîng avêtine. Her wiha got hêzên Koalîsyonê û QSD`ê der barê kifşkirina nuqtayan û izolekirina wan, gelek dewriye meşandien da ku fikara Tirkîyê were rakirin. Di heman demê de, koalîsyonê anî ziman ku hêzên Amerika û Tirkîyê 4 operasyonên hewayî pêk anîne.

Di daxuyaniya koalîsyonê de ev tişt jî hate gotin: “Em ê dan û standinên xwe û koordîneya bi Tirkîyê re der barê detayên nû li ser mekanîzmaya ewlehiyê de dewam bikin.” Di berdewama daxuyaniyê de, hate gotin ku ew ê hin noqteyên ku Tirkîyê dixwe fikaran, rakin. Serokkomarê Tirkîyê Recep Tayyip Erdogan bi domdarî gefan li herêmê dixwe, nişana wê jî di gefa dawîn de got tevî mekanîzmaya ewlekariya bi Amerîkayê re ew ê êriş bikin.

## Li Parîsê parêzer, pîlot û bijîşk dadikevin kolanan



Hikumeta Fransayê dixwaze pergala teqawitbûnê biguherîne. Xebatkarên pişeyên serbest jî bi fikar in ku wê avantajên xwe ya teqawitbûnê jî dest bidin. Bi vî armançê wê li Parîsê li qada Operayê meşeke mezin li dar bixin. Beriya meşê kolektîfê mezin hate avakirin. Di vî kolektîfê de 14 pişe hene. Kolektîfa bi navê SOS Retraîtes got ku “Di dîroka vî welaîfê de wê cara pêşîn parêzer, xebatkarên tendirustiyê

û karkerên veguheztina hewayî li hemberî vî projeyê bi hev re bimeşin.” Roja Înê jî li Parîsê grevek hatibû kirin. Di 12 salên dawîn de cara pêşîn grevêke wisa mezin hate kirin. Hikumet diyar dike ku wê pêşnûmaya guherandina vî pergala teqawitbûnê saleke din were meclîsê hewl dide nerazîbûnan nerm bike lê ji niha ve gelek rojên çalakiyan hatine diyarkirin. Sendikaya FO`yê ji bo çalakiya di 21`ê Îlonê de bang kir û tê payîn ku tevgera sendikayî ya bingehîn di 24`ê Îlonê de xwe bide diyarkirin. CGT, Solidaires û FSU bangî çalakiyên di asta neteweyî de kir.

## Tehran: Tu hevdîtin di navbera Trump û Rûhanî de tune ne



Têkildarî hevdîtina Rûhanî û Trump a li Neteweyên Yekbûyî, berdevkê Wezaretê Karên Derve ya Îranê Abbas Mûsawî bi daxuyaniyekê jî kanala fermî re ragihand: “Ez agahiya hevdîtîne piştrast nakim, ne di rojeyê me de ye û ez ne bawer im ku li

New Yorkê hevdîtineke wiha bi rê ve biçe. Em hevdîtinan ne tenê wek propaganda dinirxînin, lê divê bi encamên berbiçav bi dawî bibe, ji ber vî yekê texmînen wiha ne di rojeyê Îranê de ne.” Wezirê karên derve yê DYA`yê Mike Pompeo di 10`ê Îlonê de got dibe ku Trump Rûhanî li dervayî civînên NY`yê bê şert bibîne, lê Trump jî li ser Twitterê got: “Dezgehên ragihandinê yên nerast, dibêjin ez dixwazim bi Îranê re bê şert rûnim, lê ev daxuyaniyê wekî her carê ne rast in.”

## Gundên Amediyê hatin bombekirin

Li gorî agahiyên ji herêmê hatin wergerandin, balafirên şer ên Tirk roja Duşemê saet 10:45`ê dema herêmê bombe li gundên herêma Garê ya navçeya Amediyê ya Duhokê barandin. Bomberdûman bi hevdemî li dijî gelek gundan hate kirin. Bomberdûman bi taybetî li gundê Spêndar û derdora wê hate kirin. Ji ber bomberdûmanê zera li zeviyên gundiyan bû. Dewleta Tirk bi rêk û pêk bombeyan li gundên li Başûrê Kurdistanê dibarîne.



## Li Hindistanê keştiya tûrîzmê noqî binê avê bû

Keştiya The Royal Vashishta vessel di Yekşemê de li eyaleta Andra Pradeşê li çemê Godavari ku ava çem bilind bû noqî binê avê bû. Keştî ber bi qadeke piknikê ve diçû û 73 kes di keştiyê de bûn. Li gorî rayedarê polîsên herêmê

8 cenaze ji nava çem hatin derxistin û 26 kes jî hatin rizgarkirin. Karên lêgerîn û rizgarkirinê Duşemê jî dom kirin. Tê gotin ku 39 kes di bûyerê de winda bûne. **NÊZÎ 300 KES TEVLÎ XEBATÊN LÊGERÎN Û RIZGARKIRINÊ BÛNE.**



Li gorî rojnemaya Times of India wezîrêkî eyaleta Andra Pradeşê diyar kiriyê ku keştiya li çemê ku ava wê ji ber barana mûsonê bilind bû, lîsansa xwe ya ji bo gerandina tûristan nebû.

## DYE amade ye bersivê bide êrişê li ser petrola Sûûdê

Roja Şemiyê bi droneyan êrişî du tesisên petrolê yên li Sûûdê Erebiştanê hatibû kirin. Ji ber vî êrişê hilberîna petrolê nîveniv hatibû sekinandin. Tê diyarkirin ku ev rewşê dibe çend hefteyan bidome. Petrola Sûûdê Erebiştanê jî bo aboriya global jî

stratejîk e. Petrola ku hilberîna wê hatiye sekinandin di bazara global be bi qasî 5 jî sedî ye. Trûmp li ser twitterê got ku “Êrişî petrola Sûûdê Erebiştanê hatiye kirin. Hin sedem hene ku em bawer in ku em sûcdar nas dikin.”



Serokê DYE`yê diyar kir ku ew amade ne bersivê bidin û got ku “Lê em li bendê ne ku Keyitî divê diyar bike kê ev êriş kiriyê û divê em bi çî awayî tevbigerin.”

# ‘Armanca mîrhîcana zarokan ji bo kêfxweşiya dilê wan e’

Mîhrîcana zarokan wê li Herêma Kobanê bê lidarxistin. Endamên Komîteya amadekar derbarê amadekariyê Mîhrîcanê de dibêjin: “Amadekariyên me ji bo lidarxistina mîhrîcanê bi dawî dibin. Em dixwazin dilê zarokan kêfxweş bibe û hêviyên wan pêk werin. Armanca mîhrîcana zarokan ji bo kêfxweşiya dilê wan e.”



Bi pêşengtiya Tevergera Kevana Zêrîn û Desteya Tevergera Çand û Hunera Demokratîk (TEV-ÇAND) bi dirûşma “Zarok mîrasê hunerê ne û jiyana azad in” piştî li Herêma Cizîrê mîhrîcana zarokan bi dawî bû vî carê li Kobanê ya Herêma Fîratê di 17`ê Îlonê de, mîhrîcanê tê lidarxistin. Ji xwe niha jî li tevahî navendên Çand û Hunerê yê herêmê perwerdeya zarokan li ser beşên hunerî wekî stran, goven û şano tê dîtin.

Zarok bi tevgerêke mezin amadekariya mîhrîcana xwe dikin, da ku her kes bi hunera xwe tevî mîhrîcanê bibe. Mîhrîcanê wê sê rojan li navenda Baqî Xido ya çand û hunera Kobanê were lidarxistin. Derbarê amadekariyên mîhrîcana zarokan de, endamên Komîteya Amadekar xebatê xwe yê amadekariyê ji Ajansa JINNEWS`ê re nixandin.

**‘ARMANCA ME EM DILÊ ZAROKAN KÊFXWEŞ BIHÊLIN’** Endama Rêveberiya Tevergera Kevana Zêrîn Mîrxana Ismayîl derbarê armanca lidarxistina mîhrîcanê de wiha got: “Her sal mîhrîcanên zarokan tên lidarxistin. Armanca me jî lidarxistina vî mîhrîcanê ew e ku em dilê zarokan xweş bikin. Em zarokan

fêrî çanda wan a resen dikin û di milê hunerî, çandî û civakî de zanista wan xurt dikin.” **‘EM Ê HÊVIYÊN ZAROKAN PÊK BÎNIN’** Endama koma stranê Oryana Ibrahim a ku wê tevî vî mîhrîcanê bibe qala tevliûbûnê amadekariya xwe ji mîhrîcanê re dike û wiha dibêje: “Ev demeke dirêj e em xwe ji mîhrîcanê re amade dikin. Endamên koman bi awayekî komînal perwerdeyên xwe dibînin û hevbeşiyek û ji hev fêmîkirin di navbera me de heye. Em dixwazin hêvî û xeyalên zarokan pêk bînin, da ku zarok ji çanda xwe hezbikin. Armanca mîhrîcana zarokan ji bo kêfxweşiya dilê wan e.”

## ‘Mem û Zîn jiyana civakî ya kurdan şîrove dike’



Destana Mem û Zînê a ku ji aliye Nivîskarê mezin Ehmêd Xanî ve di sala 1692`an de hatiye nivîsîn di her alî de jiyana kurdan vedibêje. Destan ne tenê heskirina du kesan heskirina netewê jî vedibêje. Mem û Zîn ku weke kurdiya nu hatiye wergerkirin, ji aliye derhêner Ruknetin Gur ve weke lîstîk hatiye amade kirin. Şano cara yekem di sala 2014`an de ji aliye Şanoya Bajêr a Amedê ve li Qonaxa Cemil Paşa hate pêşandan. Hat xwestin ku cara duwem jî li heman cihî were pêşandan lê qeyûmê ku tayînî Şaredariya Bajêrê Mezin a Amedê hat kirin destûr neda ku li wir were pêşandan. Şano piştî 5 salan bi girseyeke mezin li Gleryayê hat pêşwazîkirin. Bi sedan kesên ku xwestin lîstîkê temaşe bikin salona Şanoyê dagirtin. Lîstîk piştî ku bi dawî bû bi sedan temaşevan li ser piyan li çepîkan da û kêfxweşiya xwe anîn ziman. **‘BI DESTANEK TIJÎ XEM RE EM JIYANA JINAN JÎ FÊR DIBIN’** Piştî ku lîstîk bi dawî bû lîstîkvan û stranbêj Gulseven Meder a ku rola Zînê di lîstîk ji Ajansa JINNEWS`ê re axivî û wiha got; “Destana Mem û Zînê jî me re tenê heskirina du kesan nabêje, ew jiyana civakî a kurdan jî bi xwe re şîrove dike. Destana Mem û Zînê di aliye çandî, dîrokî û sosyolojîk de kurdan şîrove dike û ji ber wê yekê jî bo ronîkirina pêşerojê mîftekê. Bi teybet jî

û zahmetiyan jî me lîstîka xwe da pêşandan. Temaşevan mixabin germ dibûn ji piyan diwestiyan lê cardin kelecana ku lîstîkê diafirand destûr nedida ku ji vir derkevin. Rêzan herî dawî diyar kir ku wê teqez carek din li Qonaxa Cemil Paşa werin gel hev.” **‘LÎSTIK BI HER ALÎ SERKEFTÎ BÛ’**

Temaşevan Esengul Klîç jî bal kişande ser wate û girîngiya lîstîkê û wiha got; “Şanoyên bi vî awayî dîrokî û civaka kurdan vedibêjin. Divê her tim bê navber werin pêkêşkirin. Li hember asimlasyona ku îtidar li ser kurdan dide meşandin divê em bikevin nava tevgerê. Ji ber yek jî beşên ku herî zêde bandora xwe li ser civakê dike çand û huner e. Lîstîk bi her awayî serkeftî bû. Li şuna ku kes dîzî û programên hindirê wan bi tiştên vala hatine dagirtin temaşe bikin divê werin li lîstîkên bi vî rengî temaşe bikin guhdarbikin. Destana ku cihek mezin di nava dîrokê de girîbî ye şanoyê re hatiye gel hev. Li Rextmê hemû astengî û bêderfetiyan tiştê wiha pêşkêşkirin cihê şanaziyê ye. Me bi keyfî û çoşek mezin lîstîkê temaşe kir. Hêvîda rim ku berdewamiya wê li qonaxa Cemil Paşayê be.”

**‘HER SEHNEY KELECANEK CUDA BI MIN RE ÇÊ DIKIR’** Temaşevan Robar Gungor jî got; “Min beriya 5 salAN heman lîsok li Koşka Cemil paşa temaşe kiribû lê mixabin îro nikaribûn dúbare li wir pêşkêş bikira. Kayum bi awayeke êşkere darbeye li dijî çand û hunerê ye. Ev yek me xemgin kir lê cardin, ji ber ku naveroka destanê pir xweş bû em bi dîmenê derdor re asê ne man. Hest û çoşa temaşevanên ji diyar bû ku zindîbûnek diafirand. Destan bi şanoyê re bi awayê herî xweş hatiye gel hev ku ew kurdan bi awayekê herî baş temsîl dike. Ez pêşniyîr dikim ku herkes vî lîstîkê temaşe bike û xwe jê mahrum nehêle.”

## ‘Xwedî li êş û azarê jinê derkevin’

Endama Kevana Zêrîn ya Herêma Cizîrê ya beşa şano Bera Hesen got: “Armanca me ji pêşkêşkirina şanoya ‘Jina bi tenê’ ku civak û bi giştî cihan xwedî li êş û azarê ku jin dikeşîne derkevin.”



Koma Kevana Zêrîn ya bi navê ‘Teatra Sariya Baran’ ya Herêma Cizîrê lîstîka bi navê ‘Jina Bi Tenê’ ji aliye wêjekar û şanogerê Îtalî Dario Fo û hevîna wî Franca Rane ve hatiye nivîsandin, ji aliye Sariya Golan ve jî derhênertiya wê hatiye kirin. Şanoya Jina bi tenê` li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo hat pêşkêş kirin. Lîstîkvana şano ya Koma ‘Teatra Sariya Baran’ û endama Kevana Zêrîn ya Herêma Cizîrê Bera Hesen derbarê lîstîka şanoyê û girîngiya şanoyê de nixandin kir.

Bera rola xwe ya di şanoyê de wiha nixand: “Yekemîn car me şanoya bi navê ‘Jina bi tenê’ di Mîhrîcana Şehîd Yekta de pêşkêş kir û di Mîhrîcanê de em

wek baştirîn leyistîkvan û baştirîn derhêner di asta yekemîn de bi ser ketin. Derhînera vî şanoyê Sariya Golan e. Sarta rola xwe mamosteyeke pir bandoreke erênî li ser me da çêkirin.” Bera daxwaz sereke ji pêşkêşkirina vî şanoyê bi lêv kir û wiha domand: “Her kes êş û azarê ku jin tê re derbas dibe dizane, armanca jî çêkirina şanoya ‘Jina bi tenê’ ku em êşa jinê bighînin her kesî û li ber çav be ku ev rastî jî kuderê hatiye. Bi temaşekirina vî şanoyê mirov hestê wan jinên ku bi rengêkî rojane rastî zilm û zoriyê hatine, hîs dike.”

Bera di dawiyê de bang li tevahî cihanê kir û wiha got: “Bi rêya şanoyê xwe me peyamek ji tevahî cihanê re pêşkêş kir û em dibêjin piştevaniya jinan bikin.”

## Li Dirbêsiyê pêşangeha alavên keleşorî



Di çarçoveya hewldanên parastin û vejandina mîras û çanda kurdî de, Komîteya Çand û Hunerê ya bajarokê Kermê ya navçeya Dirbêsiyê pêşangeheke alavên keleşorî yên kevn li dar xist. Di pêşangehê de alavên wekî des-

tar, bivir, sifir û teşî hene. Di vekirina pêşangehê de bi dehan şênîyên bajarokê Til Kermê, şênîyên navçeya Dirbêsiyê û kesên ku çand û bi kultura kurdî re eleqedar in, amade bûn. Endama rêveberiya Komîteya Çand û Hunerê ya Meclîsa Dirbêsiyê Emel Hemo axivî û got parçeyên keleşorî yê di pêşangehê de dîroka pêşiyên nişan didin, der wiha banga parastina keleşora kurdan kir. Paşê beşdar li hemû pêşangehê geriyar. Amadekarên pêşangehê, navên alavên kevn û çawanîya bikaranîna wan şîrove kirin. Di dawîya çalakiyê de koma Navenda Çand û Dirbêsiyê stran pêşkêş kirin.

# Serkeftinên di qada perwerdeyê de

Ji destpêka ragihandina avakirina Rêveberiya Xweser a Demokratîk (21'ê Çileyay 2014'an), di qada perwerdê de gelek pêşkêtin ji aliyê materyal û rêbazên wanedayînê de, pêk hatine.



Piştî ku Rêveberiya Xweser a Demokratîk di 21'ê Çileyay 2014'an hat ragihandin, desteyên perwerde û fêrkirinê di pêxistinaya warê perwerdehiyê li gorî rêgezên neteweya demokratîk hatin erkdarkirin. Desteyan kedên mezin dan û ji sifirê ve destpê kirin. Di destpêkê de ne xebatkar ne jî materyal li cem desteyan hebûn. Diviyabû ku deste materyal û xebatkarên perwerdeyê di demê kin qasî 8 meh de amade bikin. Ji bo peydakirina materyalên pergala neteweya demokratîk, li ser sê Rêveberiyên Xweseriyay Demokratîk Cizîr, Kobanê û Efrînê, saziyên meteryalan hatin avakirin. Hêjmarek

hindik mamoste, kesên xwedî tecrûbe û pispor cih di van saziyan de girtin. Hersê rêveberiyay bi awayekî fermî di salên 2015-2016'an de dest bi perwerdehiyê li gorî rêgezên neteweya demokratîk hatin erkdarkirin. Di wê demê de hindêk qaşî di rastnivîsê û têgehyan de derketin. Ji bo derbaskirina qaştîyan, ji bo amadekirina xebatkarên xurt, desteyên perwerde û fêrkirinê peymangêhên amadekirina mamosteyan vekirin. Li herêma Cizîrê 10 peymangêh hatin vekirin. Ji ber tunebûna materyalan di destpêkê de materyal li gorî tecrûbeyay mamosteyan û awayên amadekirina semîneran hatin amade-

kirin. Piştîre makenîzmeya perwerdeyê hêdî hêdî pêş ket û materyalek taybet ji bo peymangêhan û amadekirina mamosteyan hate dayîn. Ji wan peymangêhan bi hezaran mamoste ji her du zaynedan ve derçûn. Di sala 2019'an de 18 hezar û 621 mamoste beşdarî dewreyên havînê yê peymangêhên amadekirina mamosteyan a herêma Cizîrê bûn.

Her wiha desteyên perwerde û fêrkirinê yê her sê rêveberiyay û heta ragihandina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohjilatê Sûriyê di 6'ê Îlona 2018'an de girîngiyek mezin dan warê perwerdeyê û pêxistinaya wê li gorî pêşkêtinên ku li cihanê di vî warê de rû didin. Materyal hate pêxistin bi şewazekê ji berê baştir. Di nav de rêbazên wanedayînê û perwerdekirina mamosteyan jî.

Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohjilatê Sûriyê bawer dîke ku materyal, rêbazên wanedayînê tevî xebatkarên perwerdeyê yê gihastî mijarek gelek girîng in. Girêdayî vê mijarê hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê Semîre Hec

Elî got: “Materyalên ku nayên guhertin mirî ne û ne li gorî pêşkêtinên zanistî û çandî ne. Ew materyal dê her tim paşketî bimîn in.” Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohjilatê Sûriyê ketiye ferqa girîngiya pêxistinaya materyalan, bi taybet yê nûjen. Ji bo wê barên mezin dikevin ser milê Saziya Amadekirina Materyalan. Ji ber wê hewl dide warê perwerde û fêrkirinê li gorî pêşkêtinên ku rû didin û li gorî armanca Rêveberiya Xweser, pêş bixweDesteya Rêveberiya Xweser û desteyên beriya wê, di demê kin de xebatên mezin di warê perwerdeyê de, kirin. Heta asta amedehi materyalên xwendinê amede kirin. Peymangêh, akademi û zanîngêh vekirin.

Tê payin ku, li herêma Cizîrê 230 hezar û 489 xwendekar beşdarî pergala perwerdeyê ya 2019-2020'an bibin. Heman demê de 2 hezar û 225 dibistanan hatine amadekirin. Li herêma Fîratê jî 90 hezar xwendekar di hezar û 100 dibistanan de perwerdeyê bibînin.

Pergala perwerdeyê ya herêma Cizîrê li gorî rêgezên neteweya demokratîk e û li gorî zîmanên pêkhatiyên herêma Cizîrê ye yanî Kurdî, Erebi û Suryanî ye. Li herêma Fîratê Erebi û Kurdî ye. Ev gav wek gavê yekemîn li Sûriyê tê hesabandin. ....*ANHA*

Îsal ji ya par baştîre, sala par ji ya berê baştir bû. Çîqas derfeta peydakirina teknîkî û şarezayan pêşve çûn, ewqas mada mazotê paqijtir dibe.

Xweş Hecî ji bo bihaya mazotê wiha domand: “Bihaya mazotê di cihê sotemeniyê de 75 wereqe ye û bi bihaya 77 wereqe digîne malê. Jixwe ji bo firne ranewestin bihaya mazotê bi 55 wereqe û ji bo malbatên şehîdan bê pere wê bê dayîn.”

Rêveberiya Sotemeniyê Qamişlo Xweş Hecî Ehmed di dawiyê de got; Hêvîdarin gelê me salek xweş û germ derbas bikin.

## Mîrate û mîratzadeyên CHP

Medeni FERHO

Her fikrê nû, di diwarê statûqoparêziyê de deverekê vedike. Paradîgmeya Ocalan jî di diwarê kelîha faşîzma dewşîrme de, deverek vekirîye. Serdema me jî, di nava hawarek SOS de ye; li Tirkîye, Suriye, Îraq û Iranê ku li ser cografîya Kurdistanê pelax bûne, faşîzm û diktatorî hukumran e... Li van dewletan kakilê atomê ne teqîya ye, lê qanûnên fizîkî û civakî serûbinî hev bûne, ji bo Kurdan “dareke jiyane” hatiye nexşekirin. Sed sal in, Komara Tirkîyê jî şerê neteweyî rizgar nebûye, her dem xwestiye dara jiyana gelan tune bike. Dîroka bi qewetîyan hatiye nivîsandin, bi empozekirinê di beden û mejîyê gelan de neqşîskirin. Ev nexşeya Îtîhat û Terakî ye, piştî komarê, bi CHPê dewam kir, sistema îro jî, berhemê CHP ye. Îtîhat û Terakî, riyên resîfîkirî yê komkujiyan vekirin, CHPê jî di wê riyê de meşîya, partiyên pey re hatin, AKP/ MHP jî, di wê riyê de dimeşin.

Doh bû, piştî teqîna di rîya Amedê, serokê CHPê Kew Kemal, Kurd bi terorê tewanbar kirin. CHP, car din, di kesayeta Kew Kemalê dewşîrme de, rûdêna xwe ya qirêjê eşkere kir. Lê Kurd, ne Kurdên berê ne, di Înonu de, di Ecewît de, di Kiliçdaroglu de, rastiya CHPê baş nas dikin: Balkêş e Înonu, Ecewît û Kiliçdaroglu dewşîrme yê Kurd in... Wm jî, wan di mucîzeyay Kurd ya sedsalê de mahkum dikin. Mustafa Kemal, di vegotina “NUTUK” de, di namêya jî Lenin re şandiye û belgeyên din de gelek tişt eşkere kirine. Di namêya ku bi gotina “Hun, Birêz Serokê Min” dest pê dîke û jî Lenin re şandiye, dibêje: Ez vekirî diaxivim, di kongreya Erzirom û piştîre di Kongreya Sêwasê de, delegeyên hatin cem hev, mafê gelan yê destnîjankirina qedera xwe erê kirin.” Lê siyaseta înkâr û tunekirinê terknekirin. CHPê jî, xwe, wek partîya yekemîn û xwediyê dewletê bi nav dîke. Ev ne rast e; piştî kongreyên ku bi saya Kurdan û pêşengîya Kurdan hatin pêkanîn, bi desteka Kurdan “heft duwêl” hatin têkbirin, parlamentoya yekemîn hate avakirin. CHP, di 9ê Îlona 1923an de hate avakirin. Beriya CHPê, bi 3 salan, Partîya Komunîst ya Tirk, di 10ê Îlona 1920an de hate avakirin.

Paşayên Osmanî, Mustafa Kemal jî di nav de, bi hişmendîya Îtîhad Terakî haraket dikirin, Kurdan, ne di paşayan, bawerî bi encama Kongreya Erzirom û Sêwasê anîn. Partîya Komunîst, li Rusya “Tabura Bolşewîk”an ava kir û şande Anatolya. Serokê PK Mustafa Suphî jî, endamê Îtîhat û Terakî bû, piştîre veqetîya, diçe jî, ew û hevalên wî, ji xezaba Îtîhadîyan rizgar nebûn, di Derya Reş de hatin fetisandin. Mixabin ne biranînê Hacı Musa Beg, serpêhatiyên Hecî Bedrî Axa jî ne hatine nivîsandin. Ihsan Nuri Paşa jî serpêhatiyên xwe ne nivîsin; Biqasî 100 subay û paşayên Kurd, li Silêmaniye jîya ne, ji bilî M. Emin Zekî Beg, kesî gotinek li pey xwe ne hiştiye. Nivîs, di herka çemê dirokê de kêştî û bapor in, pusula destnîjan kirina paşerojan e, her nivîs, pelek jî dara jiyane ye.

